Opozisyona Ereb li Sûriyê wê roj ji rojê bêtir têbigihêje, li pirs û mafên gelê Kurd xwedî derkeve . Ji vê riyê derbas be, tu riyên dî li ber me nînin ku em karibin dîwarê şovenîzim û nijadperestiyê qul bikin, bînine xwar û rê li ber wekheviyê û mafên mirovan dûz bikin

*** Di rojên pêş de li Brukselê wê kongreyek li darkeve, ew weke berdewama kongra Washingtonê tê naskirin. Hevbindî daxweynek belav kir û got ku wê tu alî ji Hevbendî beşdarî Kongreyê nebin. Weke tê zanîn hûn li Washingtonê amade bûn?**

Belê, di wê civata Waşintonê de hevalek ji rêxistina Holendayê bi erêkirina me beþdar bûbû bi hêviya ku em nasbikin çêrok çi ye û dûv re em karibin bi rolekî erênî rabin . Piştre me dît ku gotin û kirinên ew kesê ku li civata Waşintonê xweditî dikir û di pê re li ya Broksêlê hevdu nagirin, lewre daxuyaniya Hevbendiyê di derbareyî rûniştina Broksêlê de, helwesteke berpirsiyar, di ciyê xwe de, parta me jî, xwediyê wê bû .

*** Li dawiyê mesaja we çi ye?**

Mesaja min ji xwendevanên zimanê dê re ew e ku, em tev li pêşgotina Nûredîn Zaza ya ku ji destana Memê Alan re nivîsîbû veger in, baş bixwînin û li ser biponijin . Rêz û silav ji rêvebiriya Malpera Avesta û xwendevanên wê re**.**

9/6/2006

Dumahîk : Pirojeya kembera...

, balav kirin. Bi vê têkiliya hovane, Kurd di gundên xwe de birçî, tazî û perîşan man. Ji derdê vê xizaniya mezin a bêbext, gelek malbat neçar bûn ku malên xwe, gund û bîranên biçûkaniya xwe li şûn xwe bihêlin, berê xwe bidin bajarên mezin ên Sûriyê yan derveyî welêt da ku ji bo nanê zarokên xwe xebatê bikin. Gelek caran jî, karên giran û gemar ku tu kes qîma xwe bi wan nayne dikin. Di encam de, hin nexweşiyên civakî di nav Kurdan de peyda bûn, ewên ku pencên xwe di stuyê zarok, jin, mêr, pîr û kalan de kûr çikandine, ew birîndar û gêj kirine.!!!

Bi armanca pişaftin û tunekirina gelê me, wan berpirsiyarên qafteng û nêzbîn ev şerê aborî û siyasî yê mezin dij gelê me bi rêve birine, bê ku carekê ji xwe bipirsin ma gelo ev şerê mezin dij vî gelê bê sûc û gunehî aştîxwaz di rajeya(xizmeta) kê de ye ?!..

Lê, tiştê mirov matmayî dihêle ew e ku rijêma Sûriyê ta roja îro, ji van pilan û projeyên xwe yên ne mirovane hemberî gelê me venagere, wê zordestiyê ji ser singa wî ranake, mafên wî lê venagerîne û lêborînê jê naxwaze...!!!.

Di vê bîranîna reş û tal de, ji me tê xwestin ku em nakokiyên xwe ji hole rakin, xebata xwe ya aştiyane geş bikin. Pêşî em destên xwe bidin hev, gotina xwe bikin yek, paşê em di nav gelê Sûriyê de dost û alîgiran ji vê doza dadmend re peyda bikin, da em hemî bi hev re ji bo hilanîna van proje û pîlanên ne mirvane têbikoşin, azadî û wekheviyê di civaka Sûriyê de peyda bikin. 6/7/2006

*Jêder: Hejmar 15 ji rojnameya (Dengê Kurd)- dawiya tîrmeha 1973-an